

Têkiliyên Enqere, Tehran û Şamê

»»» R:8



Pîroz be du cejnên Gelawêjê

»»» R:3

Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (428) 22-08-2022 Buha (1000) Tûmen*

8 sal li ser jînosayda Şengalê de derbas bû

»»» R:6

Dîsa Îran dojehê divexwe!

»»» R:7

Di rêûresimekê de rêzên Partiya Demokrat yekgirtin

Piştî derbasbûna 16 salan li ser jihev veqetiyana rêzên Partiya Demokrat a Kurdistan û piştî gihîştina bi encamê ya gotûbêjên di navbera Partiya Demokrat a Kurdistan a Îran û Partiya Demokrat a Kurdistan, herdu aliyên Partiya Demokrat yekgirtin. Êvareya roja Yekşemî, 30'ê Gelawêjê, rêûresimekê bi beşdariya sedan kadr, pêşmerge û kesayetiyên siyasî yên berên yên Partiya Demokrat hat lidarxistin, partiya hezkirî û têkoşer ya komên xelkê Rojhilatê Kurdistanê yekgirtin. Rêûresima yekgirtina Demokrat bi xwendina sirûda neteweyî ya “Ey Reqîb” û ragirtina bîstek bêdengî bona rêzgirtin ji riha pak a şehîdên Hizb û gel destpê kir. Piştî daxuyaniya hevpar ya yekgirtina Demokrat ji aliyê xwişta Xedîce Me'izûrî, endama rêberî û têkoşera berê ya Partiya Demokrat hat xwwandin. Di beşeke vê daxuyaniyê de hatibû guman tê de nine ku yekgirtina Partiya Demokrat, dibe destpêka qonaxê nû ji xebata Hizbê li dijî rejîma Îslamî ya Îranê û li dijî her zêhniyetek navendgera ku pir rehendbûna



Îran û mafên neteweyî yên pêkhatiyetên cuda yên Îranê ret bike. Herwisa hander û rê xweşker dibe bo vê ku tevgera neteweyî li Rojhilatê Kurdistanê û bibe hêzeke şûndanerek wisa ku li her guherînkariyeke seranserî de, hesabek taybet jê ra bê kirin.

Ev yekgirtina dibe piştevan bo paraştin û bihêzkirina pîrensîpên berê û girîng yên partiyê. Bi xatircemî ve ev bûyera pîroz dibe sedema vegeşîna tevgera neteweyî û azadîxwazî li Rojhilatê Kurdistanê. Ser yek kevtina wan hemû sermayeya mirovî û me'newî, piştî qalîn bilî pêgeh û îtbar û hezkirina bêmînaka Partiya Demokrat û hişyarî û ezmûna dew-

lemend û pir rehendî ya rêberî, kadran û tev têkoşerên Demokrat, gelek derfetên nû bû Partiya Demokrat diafirîne. Herwisa di vê rêûresimê de, piştî xwendina daxuyaniya hevpar, belgenameya yekgirtina Demokrat di nav çepik lêxistin û rohndkbarînen şadî û diloxweşiya amadebûyan, ji aliyê rêzdar Mîstefa Hicrî û rêzdar Xalid Ezîzî ve hat wajokirin. Rêzdar Mîstefa Hicrî di vê rêûresimê de di gotarek kurt de behs ji vê kir ku, ev yekgirtin û yekrêziya pêngaveke bivêrane ye bo werza nû li xebat û têkoşîna siyasî ya gelê me ya li dijî rejîma Îslamî a Îranê. Bi taybet di vê qonaxê de ku li navxweyî welat ner-

azîbûnan û xebata cemawerî ya tex û qatên cuda, rejîma Îslamî zirav kiribûn û li derveyî welat jî rejîm zêdetir li hemû demên din bêzirav kirbû û ji aliyek din ve bi sedema piştevanîkirin li terorîzma dewletî û nearamiya herêmê, îtbar û baweriyek di civaka cîhanî de nemaye. Her ji ber vê yekê ye yekgirtina Demokrat û rêkxistina wizeya xebatgêriya vê partiya xebatkar, hem li Rojhilatê Kurdistanê riheke nû dide bi xebata mafxwaziya gelê Kurd, û hem jî di asta seranserî de cihê bandorbûna xwe li ser hevpeymanên xwe di nav opozisyona rejîmê de didanê.

Di beşek din a vê rêûresimê de Xalid

Ezîzî, ev yekgirtin ji xelkê Rojhilatê Kurdistanê re pîrozbahî got, ku îlhamder û hevêna hemû serkevtinên Hizbê bûn û di qonaxên dijwar û nexweş yên xebat û têkoşîna Hizbê de piştî ciwanên xwe bernedane û bi cesaret û şiyana bêdawî, Hizba xwe rakirin. Navbirî di beşek din a axavtinên xwe de, behsa hewcehiya yekbûn û peyamên yekgirtina Demokrat kir û li ser mijara yekgirtinê tekezî kir û derfet bo pîrsa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê diruşt dîke û hevdem erk û gorîkirinek zêde bo xebatakarên Partiya me druşt dîke.

Hevdem ev yekgirtina wê peyamê ji saziyên siyasî yên Kurdistan û Îran, çalakvanên siyasî û medenî û xebatkarên li navxwe û derveyî welat re vê yekê dide ku serkevtin li ser rejîma Îslamî de hewcehî bi yekgirtin û bihêzkirina rêz û alîkarî û xebata hevpar heye. Digel vê yekê de jî ev yekgirtin bo paraştin û bihêzkirina pîrensîpên hertimî û girîng yên Partiya Demokrat e. Bi xatircemî ve ev bûyera dîrokî û pîroz bi piştevaniya bêdawî ya komên Kurdistanê dibe

Yekgirtina Hizba Demokrat û destpêka qonaxeke nû li têkoşîn û xebatê

Daxuyaniya hevpar

Yekgirtina Hizba Demokrat, destpêka qonaxeke nû li têkoşîn û xebatê

Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Xelkê azadîxwaz yê Kurdistanê!

Partî, sazî û kesayetiyên dost! Têkoşer, endam û tev dilsozên Hizba Demokrat

Bi kêfxweşî û şanazyê ve em radigihînin ku derencamên gotûbêjên di navbera rêberatiya PDKÎ û PDK de gihîşt bi encama dixwaz û yekgirtina Hizba Demokratê lê kevt. Demekê li Sermaweza sala 1385`a (Kanûna Pêşîn s 2006`an), PDKÎ li dirêjahiya netebahiyên navxweyî de, rastî lihev veqetiyên û codabûnê hat, ew bûyera şîpelek mezin li nîgeranî û xembariya koma xelkê Kurdistanê, sazî û kesayetiyên dost û dilsozên vê Hizbê li pey xwe anî.

Herçend ku xortên Demokrat di heyama zêdetir ji 15 salên derbasbûyî de bi ser du partiyên cuda de parve bibûn, lê xelkê Rojhilatê Kurdistanê, ti demî ev cudabûna bi erênî nezanî û biferimî na nekir. Ti demî li rexnekirin û serkonekirina xortên Demokratên xwe dudil nekirin. Ti demî jî bi givaşxistin li ser rêberan û têkoşerên herdu aliyên Demokratên û bibîranîna hewcehiya yekgirtinê, mandî û bêhêvî nebûn. Wan di nav tundûtîjî û gefên dezgehên serkutkerên rejîma Îslamiya Îranê de di her hilkeft û derfetekê de bo nîşandana daxwaziya yekgirtin û yekgirtinxwaziya xwe mifah jê vergirtin û selimandin ku Hizba Demokrat, li cem rêber û têkoşerên vê partiyê, emanet û sermayeya xebata xelkê Rojhilatê Kurdistanê ye û qebûl nakin ku ew emanet û sermaye ji vê zêdetir bi du parçeyî û dût ji hev bimîne. Xuya ye ku Partiyên dost ên berêye Hizba demokrat li Îran û beşên din ên Kurdis-



tanê û gelek ji kesayetiyên xebatkar û azadîxwazan jî bi dom handerê danûstandin, rêkvevtin û yekgirtina du aliyên Demokrat bûn. Bi keyfxweşiyê ve li nav rêberati, têkoşeran û endamên her du aliyên Demojkratê de jî yekgirtina Demokratên ne tenê wek egerek, belkî wek armancekê, ti carê nehate vêdedanê û jibîrkirin û daxwaziya yekgirtin û hizra yekgirtinxwaziye bi derbasbûna salan, ne tenê kêr reng nebû, belkî sal bi salê zêdetir geşe kir.

Îro Hizba Demokrat bi bidestxistina yekgirtina xwe, qonaxek nexweş a dîroka xwe bidawî anî. Di heyama salên jihev cudabûnê de, herdu aliyên Hizba Demokrat di piraniya meydanên tekoşînê de xuya û çalak bûn. Piştî çendîn salan dût man û ji hev cudabûna nejdilî xelkê û pêşmergeyan, carek din xelkê Rojhilatê Kurdistanê şahîde amadebûna pêşmergeyên Demokrat û cangorîkirina xortên xwe li berxwedaniya bi dijî hêzên serkutker bûn. Piştewaniya çalakvanên medenî li navxwe û piştewaniya xelkê bêzarbûyî ji bêmafî, zilm û serkuta Komara Îslamiya Îranê, di gotara siyasî û tekoşîna vê qonaxa Demokratên de girîngiyek taybet pê hat dan. Di meydana dîplomasî û pêwendiyên navneteweyî de di meydana pêwendiyên Kurdistan û Îran de, herdu Hizban hewl dan bi dora xwe nûneratiya daxwaz û çavnehîriya xelkê Rojhilatê Kurdistanê bikin. Di warê ragihandin, perwerde, sendîka, nirx dan bi warê jinan û ciwanan di refên Hizbê û di bernameya tekoşîna xwe de, mêzekirin li

ser tawankarî û binpêkirinên rejîma Îranê li warê mafê mirovî û li pêwendî digel girtiyên siyasî de li meydana girîngîdan bi gotara neteweyî û nasnamexwazane li Rojhilatê Kurdistanê de herdu aliyên bi germ û gurî zendê xwe bo xebat û tekoşînê hildan. Di heyama salên wê qonaxê de, sedan û hezaran kes li naxwe û derveyî Kurdistanê hatin nav refên Demokratê û tevlî xebat û tekoşîna Demokratên bûn. Di vî hayamî de tevî rewşa li jêr bandora jihevveqetiyên, wan herdu hizban di hejmarek ji platform û hewalbendiyên siyasî ye Kurdistanê û Îranê de jî beşdar û hevkar bûn. Tevî wan hemû raştîyan, qonaxa 15 saleya jihev cudabûn û bihevrenebûnê, bi qonaxeke nexweştî û nesirûştîya dîroka Hizba Demokrat dizanin. Wane û ceribandînan wê qonaxa dîrokiya Demokratên bo jê fêrbûnê dibe û gelek hevdem girîngin. Di rojek weke îro de ku em dixwazin rûpelek nû li dîroka Hizba Demokrat hildin, bibîranîna hinek tiştan em di cihê xwe de dibînin.

Yekem, bê guman eger Hizba Demokrat bi awayê yekgirtî maba û di wan hemû meydanên de bi yekparçeyî beşdar û amade ba, dê gelek baştir ji derfetên pêşya xwe mifah wergeritiba, destkevtên gelek mezintir di xebat û tekoşîna xwe de dê bi dest xistibana û berdengên Hizba Demokrat û tevgera neteweyî û azadîxwaziye li Kurdistanê, dê zêdetir ber bi daxwaz û peyamên vê hatibana. Duyem, Berdewamiya xebat û tekoşîna Demokratên û amadebûna wan li hejmarek ji meydanên ku amajê pê hatne kirin, eger destkevt hebûne, nirxdaneke zêde jî hebûye. Bi dehan kadr, fermande û pêşmerge û têkoşerên aşkira û nihênî di wî hayamî de di pêxema armancên Hizba Demokrat de canê xwe pêşkêş kirin. Hejmarek zêde ji xortên xebatkar ên Demokrat rastî girtîgehan, îşkence, îdam an derbiderî û awarebûnê hatin. Her di wî hayamî de dehan kesên

naskirî û têkoşerên kevnaer ên nivîşa berê ya Demokrat, çûne nava refa nemiran. Hewce ye ku îro bi bîr bînin ku daxwaza tev şehîdan û nemitran di demên dawîya jiyana xwe de yekgirtina Hizba Demokrat bû ku piraniya temenê xwe di nava vê hizbê bihorandibûn. Sêyem, ceribandîna tekoşîna bi cuda ya herdu aliyên Demokrat di vî hayamî de selimandiye ku jihev qetiyên nikare rêyek serkevtî ji bona derbasbûn ji pirsgerêk û arîşên navxweyî be. Ne tenê bi jihevqetiyên û tekoşîna cuda ji hev, belku bi ezimûn wergeritin ji şaşî û kêmasiyên berê, bi rêgirî ji hejmarek diyardeyên nerênî û nexweştî, bi rexnegirtin û vergirtina rexneyan û bi eşkere bêjiya rêberati û endamên navxweyî yê Hizbê de, bi guherîn û nûjenkirina kultûr, sîstem û şewaza Hizbatîyê û karên hevpar, bi dana derfet bo jêhatîbûnê, bi afirandina sehkirin a berpirsiyaretî di aştî yekgirtîbûn û pesendkirîyan, bi perwerde û barhênana modern a takan bo sazî û rêzgirtin ji curbicurî û cudahiyan, bi afirandina rewşekê ku her takek Hizba Demokrat a xwe bizane, kirîz û pirsgerêkên navxweyî kêr dibin û tene çareserkin. Çarem, ew qonaxa tekoşîna cuda ya Demokratên, tevî hemû xisar û destkevtan, bi xalên lawaz û bihêz ve, bi bûyerên xweş û nexweş ve, beşek ji dîroka Hizba Demokrat e. Em wek kesên ku di afirandina vê dîrokê de kêr an zêde beşdar û xwedî bandor bûne, pêka berpirsiyaretîya Hizbî û rol û helwestên xwe di biryardan û pêvajoya bûyeran de li hember dîrok û paşerojê berpirsiyar in. Qebûlkirin bi berpirsiyaretî û qebûlkirina rexne li derheq jihevqetiyên a Hizba Demokrat de, tevawkerê berpirsiyaretî û bivêriya pêngav hilgirtina bêwestîyan bo yekgirtina Hizba Demokrat e. Bi gotinek din, sipartina Hizba Demokrat a yekgirtî bi nîfşên bê, parek ji erk û berpirsiyaretîya îro me ya û kite karek e ku em dikarin xisara xemsarî û şaşî û

pevnekirina derbasbûyî heta aştêkê pê tejî bikin. Vergirtina wan berpirsaiyatiyan hewceye e û divê bibe handerê birêvebirina Hizba Yekgirtî ya Demokrat û tev têkoşer û endamên Hizbê ku bi sehkirinek zêde ya berpirsaiyatiyê, parêzvanî ji deştkevtên yekgirtinê bi taybet yekitiya Hizba Demokrat bikin.

Endamên malbata mezina Demokrat!

Rêkxistin û kesaiyatiyên azadîxwazên Kurdistanê û Îranê! Xelkê Demokratperwer yê Rojhilatê Kurdistanê!

Ji îro pêve dawî bi xebata cuda ya herdu aliyên Demokratê tê. Rêkxistin û organên saziyên herdu aliyên Hizba Demokrat di Kurdistanê û derveyî welat de pêka rêketina herdu aliyên û rêkarên diyarîkirî û li jêr rênwênî û çavdêriya rêberatiyek hevpar de, li jêr navê Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê, hev digrin û xebat û tekoşîna xwe didomînin.

Di vê hilkefta dîrokî de, di hember newestiyên û teke-siya xelkê Kurdistanê li derheq hewcehiya yekgirtina Hizba hezkirî ya xwe, anku Hizba Demokrat a Kurdistanê

yekgirtinê di heyama salên derbasbûyî de, çî li nav malbata mezin a Demokrat û çî li derveyî wê hizbê dikin. Em bi germî spas û deştweşiyê li heyetên herdu aliyên Demokratê dikin ku pêwajoya danûstandin û rêkvevtinê bi awayekî serkevtî gihandine encamê.

Em baş dizanin ku yekgirtina Demokrat yek ji daxwaziyan berheq û hivya xelkê Rojhilatê Kurdistanê bi giştî û malbatên şehîdan, girtiyan siyasî û têkoşer û endamên Hizba Demokrat bi taybetî ye. Bi boneya gihîştin bi vê daxwaziyê, em pîrozbahiya herî germ pêşkêşî wan dikin. Em wan alxeyînan dikin ku xemxwerî û heştîyarbûna wan di asta pîrsa yekgirtinê de, berpirsaiyatiyê û erkê me bona paraştina vê deştkevtê mezin, girantir dike.

Ti gumanek di vê yekê de nîne ku, yekgirtina Hizba Demokrat, dibe sedema qonaxek nû ji xebata vê hizbê bi dijî rejîma Komara Îslamiya Îranê û bi dijî her cure hizreke navendgera ya çendîn neteweyîbûna Îranê

hander û rêxweşker dibe bo vê ku tevgera netewî li Rojhilatê Kurdistanê bibe bi hêzeke xwedî bandor bi awayekê ku li seranserê Îranê her guherînek hebe, hesabek taybet bo bêtir kirin. Ew yekgirtin dibe piştevan bo paraştin û bihêzbûna pîrensîpên dîrokî û girînge Hizbê. Bi alxeyîniyê ve ew bûyera pîroz di rojhilatê Kurdistanê de dibe sedema geşekirina tevgera neteweyî û azadîxawziyê. Xistina serheve ev hemû sermayeya mirovî û me'newî, piştqahîmî bi cih û pêgeh û hitbar û heskiriya bêtir mînak a Partiya Demokrat li nav xelkê Kurdistanê de, û dilgerim bi dersvergirtin û hişyarî û ezmûna dewlemend a fire rehendiya rêberatiyê, kadr û tev têkoşerên Demokrat, de derfetên nû bo Hizba Demokrat bîafirîne.

Çavnehîrî û hêviya me ev e ku yekgirtina Hizba Demokrat, bibe sedema hêvî û dilgermiya zêdetir a qat û texên cuda yên xelkê Kurdistanê bo piştevanîkirin ji Hizba Demokrat û xebata li pêxema rizgariya netewiya wan, bi rêberatiya Hizba Demokrat. Gazî û daxwaza me di vê

navendên medenî û azadîxwazan li navxwe û derveyî welat ew e ku: Rewşa siyasya îro ye Îranê û rawestan û berxwedana bêtir mînak a xelkê bêzarbûyî yê Îranê li hember rejîma Komara Îslamiyê de, bila handera wan be bo yekgirtin û qahîmkirina refên wan, hander be bo hevkarî û xebata hevpar. Hizba Demokrat ji vir şûnda bi deştkevtî ve bo gihîştin û cîbicîkirina armanc û projeyên neteweyî û xebatkarane xwe, yek ji wan hewcehiya pêkanîna hevxebatî û hevpeymanî di navbera rêkxistinên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê, û xwe amadekirin bo rûberûbûn digel guherînan çavnehîrîkirî, de pêngavan bihavêje.

Silavên wefadarî û emegnasî bo riha paqîje şehîdan û nemirên dîroka 77 saliya Hizba Demokrat, bi taybet 3 rêberên şehîd ên Demokratê Pêşewa Qazî Mihemedî, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî. Yekgirtina Hizba Demokrat li civatên xelkê Kurdistanê û li hemû têkoşeran, endam û dilsozên Hizba demokrat pîroz be.

Îranê em serê xwe ditevînin. Bi emegnasî ve em mîzeyî hewlên dilsozane û xaziyan

û mafên netewî yên pêkhatîyên cuda yên Îranê red bike. Yekgirtina Hizba demokrat

hilkeftê de bo rêkxinên siyasî yên xebatkarên Kurdistanê û Îranê, kom û ciwat û girûp û

Hizba Demokrat a Kurdistanê Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê

Pîroz be du cejnên Gelawêjê



N: Nûredîn Sofizade

Di dîroka xebata rizgarîxwaziya neteweya Kurd de, rojek pir şewq û geş he ye ku tîrêjên wê ronî xistiye ser Kurdistanê û ev roje cem gelê me weke roja xwe dîtî û danana xîmê qahîme tevgêra netewî tê naskirin.

Ev roj jî, 25ê Gelawêjê “16ê Tebaxê” ye ku 77 salan berî niha Hizba Demokrat a Kurdistanê li ser deştê hin kesên xebatkar û xwedî pêgeh û li ser bingeha “Civaka Vejan-

dina Kurd” hate avakirin.

Felsefeya jidayîkbûn û serhildana partiya han, ku armanc vejandina Kurd de û li ser bingeha pîrsa neteweyî hatibe avakirin, bêguman wane wergirtin û ceribandin wergirtina ji dîroka xebat û berxwedanê û şoreşên berî xwe bûye.

Bi berçavgirtina kêmasî û xalên lewaze şoreş û serhildanên berê yên Kurdan, cara yekem bû ku li Kurdistanê partiyeke modern û pêşkevtî û xwedî armanc û bernamaya siyasî bête avakirin.

Hin ji wan xalên girîngin ku Hizba Demokrat 77 salan berî niha li ser hate damezrandin ewin:

1-Danana rêberîyeke bi kom

ku êdî niha şonda, şoreş girêdayî bi kes yan kit e rêbereke nebe.

2-Diyarî kirina rêberîyê ji rêka hîlbijartineke azad û demokratîk ji aliyê endamên wê partiye ve.

3-Girtina kongirê û diyarî kirina armanc û bernama siyasî ya wê partiye bi piraniya dangan.

4-Danana bernamayeke zelal û bi nivîskî û pejirandî jialiyê piraniya endamên wê hizbê, bo hêla xebatê û stratêjiyekî rohn berçavê her kesî hebe, daku gel bizane ev hizbe bo çî xebatê dike.

5-Danana peyrewa navxwe bo wê ku heçî endameke wê Hizbê li her aşt û berpirsaiy-

etiyeke de be, li çarçoveya wê peyrewê de rabe û rûnê û erk û maf û pîrensîp a xwe bizane û xwe digel wê peyrewê rêk bixe û hekî nekare wê yekê qebûl bike, nikare bibe endamê wê hizbê jî. 6-Bingeha armanc û stratêjiya xebat û hebûna wê hizbê, çareserî û bideştveanîna mafê neteweyî ya gelê Kurd û rizgariya Kurdistanê ye, ev Hizba gorî zirof û rewşa serdem û berçavgirtina qonaxa ku xebatê tê de dimeşîne, awayê çareserî û bideştveanîna wê armancê diyarî dike, îca li her rewşekê de be, metodên weke serbixweyî, federalîzm, otonomî, Xwedmuxtariyê, konfederalîzm, rêkên gehîştina bi mafê neteweyî ne ku Hizba Demokrat mifah jê wergirtiye.

»»» Dom R:4

»»» Doma R:3

7-Di vê hizbê de bû ku bo cara yekemîn tevger û rêxistîneke Kurd basê mafê demokratîk yê cudahiyan di nava civatgehê de kir, weke berçavgirtina wekheviya di navbera jin û mêran, kêmaniyên neteweyî, bê ferq û cudahiya di navbera Ol û bawerên nava civatgehê de û qat û texên curbicur weke hejar, dewlemend, gundî, bajarî, xwendewar an nexwandewar.

8-Hemî kesek xwediyê mafê azadiya xwe ye weke azadiya hizr eyan kirinê, roj-namevanî, azadiya bawerê.

9-Modern û dewlemendî û bername demokratîk ya Hizba Demokrat, hinde pêşkevtî bû ku karî bandorê dabîne li ser tevger û şoreşên perçên din yê Kurdistanê û ev jî Partiya Demokrat a Kurdistanê li Bakûr, Başûr û Rojavayê Kurdistanê bi ilham

vergirtin ji Hizba Demokrat bo xwe li perçên xwe de ava bikin û hêla xebata Hizba demokrat bikin bi bingeş û hêla xebata xwe bona bideştveanîna mafê gelê Kurd û rêbaza xebata xwe. Wate Hizba Demokrat karî pelên xwe bihavêje seranserê Kurdistanê Mezî. Belê Partiyek ku li ser vê bingeşê hatibe danîn, béguma di xebata dûr û dirêj ya xwe de hertim dikare xwediyê bihêztirîn pêgeha cemawerî be, û weke kite partiya Neteweyî ya gel tete pênase kirin, û gel jî wê partiyê bi ya xwe dizane û hêvî jê heye ku ev jî hilgîrê ra û daxwaza wan xwe digel qonaxên xebatê rêk bixe. Partiyek bi wan hemî taybetmendiyên xwe yê bilind, ku dûre ji paremayî, dîktatorî, eşîre gerî, lewma hertim dikare partiyeke zindî be û navê vê di serweyî hemî navekê be, gelek jî sirûştîye ku di nava vê Hizbê de li ber taybetmendiyên demokratîk, cudahiya bîr û rayan û cuda-

hiya selîqa kar û birêveberiyê hebe. Cudahiya boçûnan gelek caran bûye sedem ku heta parek ji endamên vê Hizbê nekarin gel hev kar bikin, yan bi dirêjahiya dîroka xebata vê Hizbê de çendî caran hin girûp ji Hizbê veqetiyane, lê piranî ku hevra bûne li ser bingeşa rast ya vê Hizbê û stratîjiya xebata vê û dîroka serfirazane ya vê, em dibînin piştî mîdehekê carek din hemî di devra bingeşa sereke ya Hizba xwe kom bûne û bûne yek.

Ji hev veqetiyên ku heya niha di nava Partiya meda çêbûne, gelek bandora xirab li ser me hebûye, gelê Kurd û dostên partiya me û xebatkarên vê, pê acîz bûne, lewma berdewam peyamên wan bo hizbê, peyamên yekbûn û yekgirtinê bûne.

Bi berçavgirtina berjewendî ya giştî ya hizbê û bihêzbûna tevgera Rojhilatê Kurdistanê û daxwaz û çavnehîriya gelê Kurd û xemxor û dostan, rêberiya vê Hizbê seh bi berpir-

sayetiya dîrokî ya xwe kirine û cehda yekgirtina aliyên vê Hizbê dane ku bi keyfxweşî ve, gehîştine encama dawiyê û serkevtinê.

Îsal di deve devê 25ê Gelawêjê 77emîn salvegera avabûna vê Hizbê de, mizginiyeke dilxweşker belav bû ku hizba demokrat dibe yek.

Cem endam û alîgirên Hizbê, malbatên xwedî qedr yê Şehîdan, dost û xemxwêrên hizbê û bi giştî cem gelê me, cejna avabûna hizbê ya îsal, dibe 2 cêjn û gelawêj ji heçî carên derbasbûyî zêdetir şewqê dixê li ser bigurtir bûna xebatê û bihêz bûna vê Hizbê û biqawet kirina îrada xebatkara, û herwisa dilêşî û şikeşt û damawîya dijminan. Lewma cejn 2 cejna Gelawêjê li herkesekî azadîxwaz, kurdekî welatparêz û malbatên şehîdên Kurd û Kurdistanê û bi taybetî li hizba demokrat û hemî xebatkarên vê pîroz be.

Peyama pîrozbahiyê ya Partiya Maf û Azadiyan(HAK-PAR) ya li Bakûrê Kurdistanê bi hilkefta yekgirtina herdu aliyên

yekgirtina herdu aliyên Demokratîk

Partiya Maf û Azadiyan(HAK-PAR) ya li Bakûrê Kurdistanê bi hilkefta yekgirtina, Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê û Partiya Demokrat a Kurdistanê peyama pîrozbahiyê şand.

Deqa peyamê wiha ye:



Pîrozbahî

Em weke Partiya Maf û Azadiyan(HAK-PAR)ê pîrozbahiyê li herdu aliyên Demokratîk dîkin ku piştî nîqaş û hewldanên bê hempa biryara yekbûnê dan û cî bi cî kirin.

Em hêvîdar in ku, yekbûna we serkeftina têkoşîna neteweya Kurd li Rojhilatê

Kurdistanê û hemû parçeyên Kurdistanê bi xwe re bîne.

Bijî Pêşmerge

Bijî Kurd û Kurdistan.

Zana SEZEN

Nûneratiya Herêma Kurdistanê

Peyama pîrozbahiyê ya Nûneratiya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyê ya li Ewropayê bi hilkefta 77emîn salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Nûneratiya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyê ya li Ewropayê bi hilkefta 77emîn salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê peyama pîrozbahiyê şand.

Deqa peyamê wiha ye:

Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriya

Rêzdar: Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Bi hilkefta 77emîn sal-



vegera damezrandina PDKÎ, pîrozbahiyên xwe yê gerim pêşkêşî binemalên şehîdan, serkirde, endam, pêşmergeyên qehreman

yên PDKÎ û tevahiya gelê me yê xweragir li Rojhilatê Kurdistanê dîkin, bi hêviya siberojeke geş bo gelê me û bideştveanîna mafên neteweyî yê gelê me li Rojhilatê Kurdistanê.

Xebat û têkoşîna Gelê Kurd li Rojhilatê herdem cihê serbilindî û şanaziya me ye, her ji şoreşa Simkoyê Şîkak, Komara Kurdistan, Pêşewa Qaziyê nemir, Dr. Qasimlo û Şerefkendî ..., û hewlên niha yê yekrêziyê û yekxistinê di nav herdu baskên Demokrat a

Kurdistanê de bi bilindî dinêrxîn û hêviya serkevtinê bo we yê rêzdar dixwazin û vê pêvajoyê bi pêngaveke pêwîst û girîng dibînin û li we û li tevahiya Kurd û Kurdistanê pîroz dîkin.

17`ê.08.2022`an

Nûneratiya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriya li Ewropa yê

Peyama pîrozbahiya Tevgera Demokratîk a Kurdistanê bi hilkefta 77emîn salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Tevgera Demokratîk a Kurdistanê ya li Bakûrê Kurdistanê bi hilkefta 77emîn salvegera avakirina PDKÎ peyama pîrozbahiye şandine.

Deqa peyamê wiha ye:

Ji bo serokatî, birêvebir û endamên Hizba Demokrat a Kurdistan û Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê (HDK/PDK Îranê)

17'ê Tebaxa 2022'an

Ji bo serokatî, birêvebir û endamên Hizba Demokrat a Kurdistan/ Partî

Demokratî Kurdistan (HDK/ PDK Îranê)

Birêzan!

Hevrê û hogirên HDK/PDKê!

Em TDK Tevger ji Bakûrê Kurdistanê, bi minasebeta yekgirtina HDK/PDK Îranê



pîrozbahiyek germ li we dikin û bi yekrêziya we gelekî şad û serbilind in.

Hevrê û mêvanên hêja!

Îro salvegera 77saliya PDK Îranê ye. Em salvegera 77saliya PDK Îranê li miletê Kurd û kurdistaniyan pîroz dikin. PDK ji sala 1945'an ve heta îro ji bo doza Kurd-

istanê bê rawestan di nava têkoşînê de bi sedan pakrewan û cangorî daye. Îro yekgirtina HDK û PDKê, baştirîn mizgînê ye ji bo şehîd û pakrewanên Kurdistanê. Yekrêziya herdu partiyên bira, şadkirina rihê pakrewanê mezin û Serokomarê yekem yê Komara Kurdistanê Qazî Muhemmed û hevalên wî, cangorî û tekoşerê

bêhempa Ebdulrehman Qasimlo, Şerefkendî û tevahiya şehîdên miletê Kurd e.

Hevrêyên hêja!

Yekrêziya we bersiveke zindî û xweragiriyek bêhempa ye ji bo Ayetullahên dîktator û dagîrker. Îro pêdiviya hevkarîya partiyên Kurdistanî û pêwîstiya rêxistinîyê girseyî û neteweyî li rojhilatê Kurdistanê heye. Em hêvî dikin ku yekgirtina we dê bibe egera patriyek girseyî û neteweyî û bibe bingeş û serencama hevkarîyê Kurdistanî.

Em weke TDK-TEVGER dubare we ji dil û can pîroz dikin û silavên biratiyê pêşkêşî we dikin.

Serkeftin dê her para miletê Kurd be.

Bijî serxwebûn, bimre dagîrkerî.

Peyama pîrozbahiyê ya Partiya Demokratîk a Pêşverû ya li Kurdistanê Sûriyê, bi hilkefta 77emîn salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Partiya Demokratîk a Pêşverû ya li Kurdistanê Sûriyê, bi hilkefta 77emîn salvegera avakirina PDKÎ peyama pîrozbahiyê şand.

Deqa peyamê bi wî awayî ye:

Berêz: Mîstefa Hicrî sekreterê (Partiya Demokrat a Kurdistan a Îran)

Berêz: Xalid Ezîzî sekreterî (Partiya Demokrat a Kurdistanê)

Silav û rêz:

Bi boneya (77)emîn saliyada damezrandina Partiya we ya xebatkar û têkoşer, bi navê Deftera Siyasî ya Partiya me (Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurdî li Sûriya), em we û hemî endam û alîgirên we pîroz dikin û hêviya serkeft-



inê ji xebata we re dixwazin, her weha ciyê dilxweşiyê ye ku hûn îro gavên girîng davêjin ber bi yekxistin û yekrêziya vê partiya xebatker, partiya şehîd (Pêşewa, Qasimlo, Şerefkendî), û bi hêzkirin û xurtikirina xebata we ji bo bi deşxistina mafê miletê Kurd li Kurdistanê Îranê..

Yê me hêviya xurtkirin û kûrkirina pêwendiyên du qolî yên mijoyî dikin yên di navbera herdu partiyên bira de..

Her serkeftî û serfiraz bin.

Qamişlo 17'ê.8.2022'an

Deftera Siyasî

Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê

Peyama pîrozbahiya Partiya Yekîtiya Neteweyî Demokratîk a Kurdistanê bi hilkefta 77emîn salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê Demokrat a Kurdistanê Îranê

Partiya Yekîtiya Neteweyî Demokratîk a Kurdistanê bi hilkefta 77emîn salvegera avakirina PDKÎ peyama pîrozbahiyê belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Birayê me yê rêzdar Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê û endamên Deftera Siyasî yên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê.

Digel silavek germ a birayane...

Rêzdaran, li ser navê xwe û endamên Mekteba Siyasî û Komîteya Serkirdayetî û tev endamên Yekîtiya Neteweyî Demokratîk, bi hilkefta 77emîn salvegera damezrandina Partiya têkoşer ya we, "Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê"(PDKÎ), ciwantirîn pîrozbahiyên xwe pêşkêşî we û tev hevalên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê dikin, û herwisa hêvîdarin ku salvegera da-

mezirandina partya we bibe faktora pêşveçûn û xala guherînkariyê û serkevtinên zêdetir li pêxema xizmetkirin bi doza rewa ya gelê me.

Di demekê de ku, salvegera damezrandina "Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê" bibîr tînin ku, Kurdistan û Rojhilata Navîn bi awayeke giştî û bi taybet Rojhilatê Kurdistanê di rewşek gelek heştyar de ne û komek eger û pêşhat û guherînkariyên mezin çavnehêrî tînin kirin, li ser me û tev aliyan hewce ye ku berjewendiyên bilind yê neteweyî û nîştîmanî berçav bigirin û li pêxema yekîtiyê yendengiya Kurdan û mifah wergirtin li guherînkariyan xebatê bikin, bêguman yek-

bûn û yekdengiya me, bîbandortirîn çeka me ye bona rûbirû bûn li hember pîlanên dijmin û nehezên me, her di vê derheqê de hewlên we yê bona yekgirtina herdu aliyên Partiya Demokrat bilind dinirxînin û çavên me ji vê yekê ye ku, di demek lezgîn de ev hewl bigihîjin bi encamê û yekgirtina yekcarî rabigihînin, bi baweriya me yekgirtina herdu aliyên Partiya Demokrat û pêkanîna eniyekê bo hêzên Rojhilatê Kurdistanê û bi lidar xistina kongireya neteweyî ya seranserî dibe faktora sereke ya yekrêziya me, her bi vê sedemê ye ku hewce ye em tev alî li pêxema vê encamê de têbikoşin.


Di dawiyê de, dubare hêviya serkevtinê bo we dixwazim û silavan dikin li xebat û berxwedaniya Rohilatê Kurdistanê, û herwisa bi hormet ve temaşeyî vê dikin û hêviya pêşveçûn û serkevtinê bo xebata Rojhilatê welat dixwazin û tekez jî dikin li ser qahîmkirin û pêşvebirina pêwendiyên birayane yê di navbera me de û herwisa li pêxema zêdetir xizmetkirin û ber bi pêşvebirina doza rewa ya gelê Kurdistan û gihîştin bi mafê rewa yê me ...

Digel silav û rêzên dubare yê me.

Her bijîn û serkevtî bin bo Kurd û Kurdistanê.

Brayê we
Xefûr Mexmûrî
Sekreterê Giştî
Yekîtiya Neteweyî Demokratîk a
Kurdistanê(YNDK)
15.8.2022`an

8 sal li ser jînosayda Şengalê de derbas bû



N:Kemal Tolan

Weke ku gelek jî we birêzan jî bihîştîye, çekdarên DAIŞê Heşt sal berê di 3ê Tabaxa 2014`an de êrîşî li ser mêr, jin, zarok û kalên Êzdiyên herêma Şengalê, yê sivîl û bê gunc kirin. Ewan hovan bi deh hezaran endamên civaka Êzdî li ber çavên cîhanê û bi komkirî qetilkirin. Bê jimar keç û jinên Êzdiyan revandin, birin bi darê zorê jî dîr derxistin, îşkencekirin û kirine koleyên xwe.

Mixabin, eva 8 salin ku li ser vê jenosaîda fermana 74`an yê Êzdiyan de derbasbûn, hîn

jî gelek zarok, jin û keçên Êzdî di destê DAIŞê da dîl in. Qedera bi deh hezaran endamên civaka Êzdî yê ji axa xwe ya pîroz qutbûne û koçberbûne, di nav kampên cur bi cure de dijîn ne di-yare. Şengala ku beşek ji axa başûrê Kurdistanê ye, hîn jî kavil e û ava nebûye.

Ez weke nivîskarekî Êzdî û Kurd, daxwazê ji berpirsyarên "Partiya Demokrat a Kurdistanê Îraqê", Hikûmeta Herêma Kurdistanê, hemû hêzên siyasî û dezgehên Kurdistanê dikim, ew bona çareserkirina pirsên Şengalê, hîn zêdetir alîkarî, kar û xebatê bikin.

Em baş bizanibin heta ku, partî û rêxistinên Kurdistanî wan sedem û sûcdarên tevkujiyan, ji me û hemû kesên malbatên cangoriyan re zelal nekin, sûcdar di dadgehên navdewletî û di dadgeha Mafên Mirovan a Navnetew-



eyî de nehên darizandin, wê jenosaîda me Êzdiyan di nav qada nevnetewî de bi tamamî neyê pejirandin.

Lewma, ez hêvî dikim ku, em Kurd jî bikaribin bi hêza zanîn, kiryar û tifaqeke Kurdewarî, hemû nakokî-pirsgirêkên ku li pêş û di nav civakên Kurdî de hene, bixwe çareser bikin. Herêma Şengalê jî di nav Kurdistanê de serxwebûyî de ji bo me Êzdiyan weke parêzgeheke Êzdîxanê ye, û otonom bi hemû Dewletên Yekbûyî

yên Amerîkayê(DYA) , di nav tevahiya neteweyên NATOyê û welatên cîhanê de hene bidine pejirandin û bi parêzin!

Ez weke Êzdiyekî, spasiya hemû siyasî û dezgehên Kurdistanê, tevahiya kesayetî, sazî, rêxistin, çapemenî, mal, komeleyên Êzdî û Kurdan, yê ku bi peyamên xwe 8mîn salvegera jenosaîda Şengalê, qahremanî û fermanên Êzdiyan bibîranîn û bibîrtînin dikim.

Hêvî ji Xwedê û Tawisî Melek dikim ku, ew tevahiya zarok, jin, mêrên Êzdî û yê hemû Kurdperwerên ku di FERMANA ŞENGALÊ de ya 03.08.2014 de cangorî bûne bi rahmeta xwe şad bikin!

Kemal Tolan, berhevkar û xemxwarê kevneşopên Êzdiyê!
08.08.2022

Nerîna Lîderan



Volodymyr Zelenskyy:

“Rûsiye renge êrîşên bi sam li ser Ukranê encam bide”



Erdoxan:

“Em danûstandin digel Sûriyê red nakin”.



Benny Gantz:

“Wezîrê Berevaniya Îsraîlê: Êrîş bo ser Îranê pêşbînî kirî nîne”.



Michael E. Kurilla:

“Hewildanên navnetewî kilîla kontrolkirina rejîma Îranê ye .”

Dîsa Îran dojehê divexwe!



N: Eskender Ceiferî

Di heyamên derbasbûyî de rejîma Îranê careke din îdia kir ku ew bombeyê naxwazin û careke din Danûstandinên Etomî deşt pê bikin.

Lê tiştê balkêş ev e ku niha êdî ew derxistina navê Sipaha Pasdaran ji lîsta têrorê a Amerîkayê weke pêşmerc nadanîn.

Eger wisa be, dîsa Îran dojehê divexwe.

Di dema deşthilatdariya Hesên Rûhanî de, roja 14ê Reşemeya 99'an, Mihemd-ceedad Zerîf wezîrê derve yê rejîma Tehranê ragihand ku êdî rêkeftina Etomî ji aliyê wan ve nakeve ber bas. Ev jî di demekê de bû ku welatên Berîtanya, Feranse û Alman-yayê ragihandibûn ku ji bo nîşandana niyazpakiya xwe, reşnivîsa li dijî Îranê nadin Ajansa Navdewletî ya Etomê.

Pişt re Donald Trump serokkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê dewsa xwe da Joe Biden û dihat pêşbînîkirin ku dewleta Biden vegere ser gotûbêjan ji bo rêkeftina etomî bi Îranê re. Di vê navberê de Rêformxwaz heftim dibêjin rêkeftinê dixwazin lê Sipaha Pasdaran dibêje nabe rêkeftin bê kirin.

Niha ne Rûhanî maye û ne Trump. Joe Biden û Îbrahîm Reyîsî hene. Lê dîsa jî siyas-etên van welatan, her siyas-etên berê ne.

Di rastî de armanca rejîma Tehranê berhemanîna bombeya etomî ye. Ew, demê bi kar tînin û bi meyndina Oranyoma zêdetirî 20 ji sedî, nêzikî berhemanîna bombeyê dinbin.

Niha dewleta Biden jî dixwa-

ze rê li ber Îrana Etomî bigire û ragihandiyê ew dixwazin ji bo rêgirîkirin ji berhemanîna bombeyê ji aliyê Îranê ve her karî bikin.

Îsraîl jî bi Amerîkayê re hevnerîn e û dibêje nabe Îran bibe xwediya bombeyê.

Komara Îslamî jî bersiva berpirsên Îsraîlî û Amerîkî dabû û gotibû: Wê cihan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîl dike, ji bîr neke. Piştî ku Donald Trump peymana etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amerîka jî xwest rêkeftina etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew libenda piştgirîya hevalbendên xwe yê Ewropî ne. Tillerson got jî ku xelên rêkeftinê têra xwe tund nîn in û rê li ber bernameya etomî ya Îranê nagirin ji ber vê jî ewê cara yekê bi Cevad Zerîf hevtayê xwe yê Îranî û wezîrên derve yê welatên ku peyman îmza kirine re, bicivin û mijarê gotûbêj bikin. Wê demê Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amerîkayê bû, li ser helwesta Amerîkayê ya di derbarê Îranê de dabû xuyakirin ku helwesta nelihevîkirinê ya Donald Trump serokkomarê wê demê yê Amerîkayê ya derbarê Îranê de û rexnekirina bernameya etomî ya Îranê cihê fikarê ye.

Feranse, Berîtanya û Almanya difikirin ku eger Îrana Etomî bikeve Rojhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji deşt bidin. Lewma jî reşnivîsa li dijî Îranê nedan Ajansa Navdewletî ya Etomê ji bo ku niyazpakiya xwe nîşan bidin û Îranê vegerînin ser maseyê. Lê bi daxuyaniya Zerîf, derket holê ku êdî Îran rêkeftinê naxwaze.

DYA bi raportên çalakiyên etomî yê Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara weza-reta Derve ya Amerîkayê hemû wan pirsyaran bersiv nade ku çima Amerîka di

îmzekirina raportan de dudil e û sedem çî ne lê bi gotara Hesên Rûhanî zelal dibe ku dorpêçên nû yê aborî, gefê li rêkeftinê dikan. Rêkeftina etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlibûna welatên ewropî hatibû îmze-kin û li gora wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêmkirin û di hember de jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin.

Îsraîlê jî deşt pêkê ve ragihand ku ew, vê rêkeftinê naxwazin. Beriya niha jî berpirsên saziya Nehêlana Çekên Etomî ragihandibûn her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriye, lê çavên Ewropiyan li Amerîkayê ne. Her biryarekê ku Waşington diştine, ji wan re dibe bandor. Berîtanya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên etomî yê Îranê demlîdeşt îmze bike lê Trump li pey planeke din digere.

Ji bilî berpirsên bilind ên Îsraîlê, fermanîdarên wan jî di-din xuyakirin ku eger rêkeftin bê kirin, Îrana Etomî, wê Rojhilata Navîn dagir bike.

Almanya, Berîtanya û Feransê ku rolele mezin di rêkeftinê de hene, dibêjin bi meyndina 20 ji sedî zêdetir a Oranyomê, êdî derfet ji bo rejîma Tehranê çê dibe ku zêdetirî berê bo ser cihanê bibe gef.

Di beşeke din a daxuyaniyê de tekez hatiye kirin ku meyndina vê asta Oranyomê ne ji bo karûbarên pîzîşkiyê û ênêrjiyê ye lê belê li tevahiya cihanê, ev asta Oranyomê tenê ji bo karûbarên çek û berhemanîna bombeyê tene bikaranîn.

Li bendê ye armançên Îranê ji bo gerra nû ya danûstandin- nan û herwisa encamên wê eşkere bibin.

Têkiliyên Enqere, Tehran û Şamê



N: Ebdûlazîz Qasim

Ev demeke û bi taybetî piştî civîna sêqolî ya Tehranê di 18'ê meha borî de, di navbera Putîn, Erdogan û Re'îsî de nûçeyek di medaya Tirkîyê de li ser asayîkirina têkiliyan di navbera Enqere û Şamê de bi xurtî belav dibe û li gor gelek çavkaniyên ragihandinê ku 5 daxwazên hevbeş di navbera Enqere û Şamê de hene ji bo dubere vekirina kanalên peywendiyên di navbera her du welatan de, û tinekirina hebûna gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê, xala hevbeş û herî



serekî di nav wan daxwazan de ye.

Tevî ku li vê dawiyê gelek caran behsa têkiliyên di navbera Tirkîyê û rejîma Sûriyê de tên kirin û ev yek ketiye di rojevê de û dûr nîne ku têkilî di navbera herdu aliyên de ticarî nehatine birîn û her tiştên bûyîn bi hevahengî û rêkeftin di navbera herdu aliyên de hatine pêkanîn û di nav de bi taybetî heta dagîrkirina navçeyên Kurdî "Efrîn, Girêspî, Cerablîs û Serêkaniyê", û daxuyaniya

berî çend rojan ya Wezîrê Derve yê Tirkîyê Mevlut Çavuşoglu li ser pêwîstiya lihevkarîna rejîma Beşar Esed û opozîsyona Sûriyê vê yekê piştraşt dike, nemaze ku Erdogan bi xwe di roja Înê 19'ê Tebaxê de ji bo roj-namevanan got ku "divê em li gel Sûriyê gavên pêşkeftî bavêjin, ku em bi rêya wan gavan dê bikarbin gelek pîlanan yên li ser cîhana îslamî pûç bikin", herwiha got ku "hemû gavên Tirkîyê li bakurê Sûriyê, li rojavayê Firatê, li rojhilatê Firatê, heta

Behra Spî bi hevkarî ligel Rûsyayê hatine pêkanîn".

Yek ji Alfebêya siyaseta kurdî ye, ku divê her kurdek bizanibe ku her çend nakokî di navbera dagîrkerên Kurdistanê de hebin, lê li ser pîrsa kurdî rêkdikevin û digehêjin tifaq û lihevhatinê, û berovajî ku ev zêdetir ji 11 salan heye xebata aliyên kurdî yên Rojavayê Kurdistanê bûye duberekî yek ji bo tinekirina yê dine, ku îro li gorî pêşhatên siyasî û pîlan û rêkeftinên êşkere û yên nehîni di navbera Enqere, Tehran û Şamê de, ku divê aliyên kurdî yên Rojavayê Kurdistanê rêkbikevin û xwe yekdeng û yekalî bikin, her ji aliyê helwesta xwe ya siyasî û neteweyî ve û hem ji aliyê têkiliyên xwe ligel Tirkîyê û Rêjîma Sûriyê û heta radeyekî ligel Rûsyayê jî, wek xuyaye ku her tişt bi hevkarîya Rûsiya hatiye pêkanîn.

Roştem Cihangîrî: "Felsefeya damezrandina PDKÎ bideştveanîna mafên destbiserde hatinê girtî yên gelê Kurd e".



Roştem Cihangîrî, "Berpîrsê Dezgeha Çavdêriya PDKÎ

Min digel rêzdar Roştem Cihangîrî berprisê Dezgeha Çavdêriya PDKÎ hevpeyvîn pêk anî û navirî got: "Felsefeya damezrandina PDKÎ bideştveanîna mafên destbiserde hatinê girtin yên gelê Kurd e".

P: Felsefe û armanc ji avakirina Hizba Demokrat çî bûye?

B: Felsefeya damezirana Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, gelek rohn û eyane, bideştveanîna mafên dest

biserde girtî yên gelê Kurd li Kurdistanê, bideşt xistina azadî û demokrasiya mafên miravane ku bi dirêjahiya dîroka Kurdistanê li Kurdan dest bi ser de hatiye girtin.

Welatê Kurdan parçe parçe kirine, gelê Kurd xistine bin gefên ji navbirinê û azadiya kesîn bi tevahî jê şandin e. Dixwazin krameta neteweyî ya wan bin pê bikin û weke îsan digel Kurdan reftar nayê kirin, xort û lawên Kurd ku daxwaza mafên neteweyî yên xwe dikin, an daxwaza wê dikin ku weke însanan çav li Kurdan bê kirin, tên destbiserkirin û kuştin.

Welatê Kurdan hatiye dagîrkirin, ti mafek ji gelê Kurd re nayê dan, tewahiya serwet û samana binerd û sererd ya bajarên Kurdan talan dikin û Kurd li belengazî, hejarî û paremayî de bicih dihêlên. Kurdistan welateke dewlemend û xwedî samana sirûştîye, lê Kurdistan li

warên aborî û pêşkevtinê coda de gelek paremaye.

Bo felsefeya damezrana Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, vêdebirina nîrê êxsîriyê, derxistina Kurdan di bin barê feqîrî, hejarî û bindestiyê de ye, azad kirin Kurdistanê û damezirandina îdareyên Kurd û Kurdistanê bo Kurdan, Kurd weke neteweyekê li ser rûyê vî erdî bê naskirin, û mafên wî bînd pesend kirin, bi kûrtî weke însanan îroyîn, çav lê bê kirin. Ew mileta li axa xwe û welatê xwe çarenivîsa xwe xwedî derkeve dakû bibe xwedanê welatê xwe û mafên xwe yên civakî, siyasî, kultûrî û çandî, bizimanê xwe bi azadî biaxive û binivîse.

P: Vê Hizbê bona gihîştina bi armancên xwe ku bideştveanîna mafê neteweyî û rizgariya Kurdistanê ye, heya niha çawa qonaxên cuda yên xebatê birîne?

B: Wê partiyê bi dirêjahiya 77salan, xebitîn û têkoşîna xwe, li çendîn qonaxên corbicor de xabata xwe meşandiye. Li sala 1945'an dadimezir e, li wê zirofa wî serdemî ya piştî şerê duyem yê cihanî, ku serdemê rizgariya gelên bindest bû, li çengên qirêj yên faşîzimê de, Komara Kurdistanê bi paytextiya Mehabadê hat damezrandin, bi yekem car Ala Kurdistanê bi fermî li ser îdare, balaxane û şaneşînên hikûmetê hat hildan, Hêza Pêşmerge bi navê Sîpa Neteweyî hat damezirandin, qotabxane û xwendîngeh bi zimanê kurdî hatin ava kirin. Jîna kur û xortên Kurdistan de yekîtiyên xwe ava kirin û xebatên civakî û kultûrî û çandî hatin birêve birin, serkomarê Kurd bi coreyekî gelerî di nav gel de hat hilbijartin, govar û pirtûk û rojnameyên Kurdî hatin çapkirin, radyo û çapxana kurdî hat danîn.

»»» Doma R:8

Azadiya kesîn, civakî, sî yasî û kultûrî li wan cihên deşhilata hikûmeta Kurdan de bi şeweyeke berbilav hat dayîn, ji bo yekem car roja Kurdan helat, û her ji ber vê yekê helbestvanê Kurd Hejar Mukiryanî helbestvanê Komara Kurdistanê li roja damezrana Komara Kurdistanê li meha Rêbendanê de dibêje:

Roja me Kurdan helat, sed Buhar qorbana wê Zivistanê! Helbestvanê Kurd neheq nebû biraştî Kurdistan rizgar û azad bibû, nîrê êxsîriyê firedabû, xwe serbest û azad didît, û bêhineke nû dida.

P: Ev pîrensîp û eslên ku di heyama 77 salan de bûne sedema man û berdewamiya vê Hizbê, çine?

B: Partiya Demokrat a Kurdistanê li 25`ê Gelawêja sala 1324`an beramber 16.8.1945`an, li ser deştê Pêşewa Qazî Mihemed hat damezrandin, di yekemîn karên xwe de hewla bideştveanîna mafên Kurd û piştevanîkirin ji rizgarî û azadiya parçên din yên Kurdistanê bû, û tevgera Kurd û Kurdistanê, welatê Kurdistanê, mala hemû Kurdan dizanî, ya duyemîn parastina krameta mirovê Kurd û Kurdistanê, ya sêyemîn jî, demokrasî û parastina mafên wekheviyê bû hemû

rûniştîyên nav cografiyaya Kurdistanê.

Azadiya kesîn bû hemû aliyekê, bixasmanî azadiya jinan mafê wekheviya mêran li nav malê û nav civaka Kurdistanê de, bawerîhebûn bi plorarîzma siyasî li Kurdistanê û li wan cihên ku Kurd vir dijîn, ştaratîjiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ye. Hemû parên Kurdistanê bira û dostên ştaratîjîk yên hevdu in, heta niha jî û niha şûnda jî ew siyaseta ştaratîjîk ya negor ya vê hizbê ye. Li nav pîrêstîj standina mafên Kurdan û cîbicî kirina demokrasî û rêberiya bi kom û azadiyên kesîn, bawerî bi rizgariya gelên blindeşt ên Îranê û li wan cihên ku Kurdistan bi ser de hatiye parvekirin, her yek bûn sedema vê yekê ye ku bi dirêjahiya wan 77 salan bi hezaran metirsiyan û şer û malwêranî û terora sedan bigira heta hezaran kadir û pêşmergeyan li nav wan hemûyan de li berî hemûyan terora rêberê bêminak yê me Dr.Ebdurehman Qasimlo û cêhgirê wî yê bi emeg, Dr.Mihemed Sadiq Şeferkendî hatin şehîd kirin. Lê ew partiya her bi wan xasîk û pîrensîpên xwe vefadar ma ye û li meydana xebatê her çalak û aktîve, û pîlanên dijminan nekarîn vê partiyê li meydana berxwedanê derbixînin. Her siwar çak û pêşrew û xwedî xet û nîşanên wê bûne çiqila çavê dijminan

û hezkiriyê di nav gelê xwe de.

P: Piştî derbasbûna 77 salan bi ser avabûn û xebat û berdewamiya vê Hizbê, niha rewşa pêgeha siyasî, û bandora wê li ser civatgeha Rojhilatê Kurdistanê çawa dibî?

B: Hûn dizanin em îsal 77 saliya partiya xwe de pîroz bikin, di wan 77 salan de herçavan ku min li jorê jî qala vê yekê kir, Kurd û Kurdistan bo Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê xeta Sor e, yanî ticarî li ser mafê Kurd li ser xortên Kurd misalihê nake, gelek caran mifahên hizbî yên xwe fîdayê mifahên giştî anko gelê Kurd û Kurdistanê kiriye, weke Partiya Demokrat a me momkîne gelek caran ziyan dîtibe, lê me nehêlaye ziyan bigihîje Kurd û Kurdistanê, çimkû her wek çîna berê gotine Kurd û Kurdistan bo Partiya me xeta sor e, hemû tişteke de fîdayê Kurdistanê bike, bo vê yekê jî gelek caran neyar û rikeberên me li hember wê partiyê de pîlan bikar anîne, lê dîsan bi ser bilindî ev partiya rosor û ser firaz serkevîye, îsal salek pir girînge bo rojhilatê Kurdistanê û bi xasmanî Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, partiyeke cihgirtî û şûndaner e, diba ku bo hemû core pêşhatineke diyar û nediyar amade bike, çend salan berî niha ew Hizba însî`ab tê kevit û piştî

derbasbûna çendîn salan, vê partiya berpirsyar, bixwe kevtine diyalogek dostane û hevalane qîrar dan ku, hevdu bigirin, niha qonaxên hevgirtinê bidawî bûne, û emê vê hevgirtinê bikin eydane bo vê sersala Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bo gelê xwe. Hêvî dikim ku gelê Kurd wê ji me qebol bike, hêvî dikim gelê Kurd li xetayên me weke partiya me efo bike.

Ez bawerim ku gelê me de me efo bike, û partiya me jî de herwisa bo standina mafên neteweyî û rizgariya Kurdistanê de her pêşeng û çelengê meydana xebata rizgariyê bibe.

Bijî 77saliya damezirandina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, partiya hezaran şehîdên serfiraz, bi xasmanî şehîdên rêber:Qazî, Qasimlo û Şeferkendî ye.

Sipas bo we ku ev derfeta pê anî ku ez bikarim ji rêya rojanemaya Agirî ve dîroka tijî serbilindî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê nîqaş bikim.

Ser bikive xebata rizgariya neteweya Kurd û mirin û neman bo dagîrkerên Kurdistanê û herwisa serkev û berdewambûnê ji bo we û tev şafa rojnameya Agirî hêvî dikim.

Çîrok:Tawana pîroz



N:Bêhzad Qadirî
W:Hesen Mukerem

-Ten Tawana min ev bû ku tu wisa bizanî ku ev tawan e?
-Na! Biraştî ev tawan nine, lêbelê ji dîtingeha me ev tawan nine, li dîtingeha wan ev tawan e, mezintirîn tawan: Li kuştin û birîn û diziyê girantir e, lê min bédengî

hilibjart, min ti tişteke nedigot, min nedida berhev, min dadwqerî nedikir, û tenê pirs dikir: Karê min pirs kirin û hûr bûn li ser mijaran e. Tevî vê yekê jî ti tişteke din ji deştê min nayê! Helbet dibe ku bikarim yaku raştîye û hebûna vê heye, nîşan bidim û vê zeq bikim, dadwerîkirin ji xelkê re dimîne, lê di raştîyê de eger ev jî dadwerên baş bin, an her xelkek dadwer mabin!
-Eger ev karên ku min encam dabin tawan bên hesab kirin ev bi şanaziyê ve tawanin. Min çavên wê didîtin û bi ti awayî poşman nebûm, peyvên wê ev yek diselmandin, koma peyvên micid, peyît û



tijî moral. Wan dixwaştin min poşman bikin, wan dixwaştin krameta min bişkênin lê ez ne poşman bûm û ne jî krameta min şikest. Ev çavên han ji wan çavan nebûn ku poşman bin, ev peyvên han tenê 4 peyv nebûn! Cîhanek ji peyvên bû, li dijî newekhevî û cudahîdanînê sekinîn, micidbûn û pêdagîrî-

yek mezin pêve diyar bû.
-Li rêstûranekê li ser maseyeke qaweyî li hember yektir rûniştibûn, hewayê derve lêl û tarî bû, esman amadeyî barînek tund bû, metrek mewda di navbera me de hebû.
-Ev hevdîtina dikarî dawîn

»»» Doma R:9

hevdîtin be, hem bo min û hem jî ji bo wî, tirsar guh û

çavên derdorê jî li ser bandor kirbû, hîn jî bêhna girtîgerhê jê dihat, bêhna sivkatîkirin û bêhna cudahîdanîn û Kurd-bûnê jê dihat.

-Mandî bû, peyva mandîbûnê kêrî wî nedihat.

-Bêzar bû jî vê yekê ku Kurdane nejiyaye bêzar bû.

-Peyva mirovahî û biratî û xwişkati dilê wî dixeland.

Tûşî azarên derûnî û hesret û janê bibû. Lê biryar standibû ku êdî li destê wê çerxa felekê netirse.

-Min jê ra got: Êdî dev ji te bernadin tu bo her tm dibin çavdêriyê de yî, çima naçî û ji wir dernakevî!? Here bo welatek din.

-Bi wî bejna xwe ya zîrav bêhnek kûr mişt, min îhsas dikir ku Oksîjîna di nav rîstûranê de nehêla ye, peresoyê min givaş xîstbûne li ser dilê min, dengê her kîna xwînê di nav demarên xwe de seh dikir, gilîlka çavên min dişevtîn.

-Bêhna xwe da derve û got: “Ber bi kuderê ve herim? Tenê heta ji aliyê din yê sînûrên destçêkirî yê nîştimana min bixwe jî, hevziman û hev xwînên min, min weke mîhvan dibînin. Li derve min tûşî sedan nesaxiyan dikin, min dema vê yekê tune ye, bo bejna xerîbiyê helbestan vehûnim, staila cuda yê fîgorên rewşenbîran ji xwe bigirim. Dema vê yekê min tune ye ku tûşî xemokiyê bibim, derdûdilên xwe li ser rûpelên Facebook û torên civakî vala bikim.

-Demek rawesta û berdewam kir: “Ez bixwe jî eger bixwazim herim ne pêyên min bi min re tînin û ne jî çavên min û ne jî zimanê min, pêyên min hînî sekînîn li polên wanegotinê de ne û çavên min ji çavên dersxwanên min hêz û tîne verdigrin. Zimanê min jî bo wan nebe, bo erd û esman jî nagere, demarên min xwîn tê de nine, Alfbaya Kurdî tê de diherikin. Êdî karê dilê min jî tenê şandina xwînê bo xaneyên laşê min nine, ez bi vê yekê ve zindî me û ev jî bi nîştiman ve.

-Helbesteke Me'irîf Axayî jî xwend:

-“Ax şiyana koçberiyê nine, -Ewa remiza mana hertimî ya min di wî welatî de ye”.

Wê tenê lîvên xwe sor dikir, û xawika wê ya reş hîn bêhtir rûyê wê yê gewr lîl kiribû.

Min pê nûs digel kaxezekê li berahîka wê danî. Me temaşeyî nav çavên yektir kir, lîvîhêrîn ji vê yekê kûrtir bûn ku çavên min hêza ragirtina vê hebin! Min şiyana hilgirtina peyvên xwe jî tunebû.

-Bi cesaret ve min ji xwe re got: Lê yê ku li serweyî tev yasayan in, yasa bixwe ne! ne pê te, ne zimanê te û ne jî dil û hawarhatinê te ne”.

-Bila wî demî dîrok li ser me biryarê bide.

-Tenê bi vê hevokê bersiva min da! Hin deman tûşî hey-rîmayînê dibûm! Çi tiştek dikare ji canê mirov şîrîntir be?! Çawan armancek dikare wiha mezin be ku poşmanbûn û paşekêşîkirin li ferheng-nameya te ji nav bibe?!

Çawan mirov dikare rêyekê hilbijêre ku egera vê yekê heye hemû ciwanîya xwe an hemû temen û heta canê xwe jî di vê rê de pêşkê bike?! An li hemûyan xerabtir, tendrûstiya derûnî û laşê wî/ê jê biştînin û piştîre bizivîrinin bo nav civakê, civakeke ku li her girtîgehekê xebatire, koma mirovên ku tenê li rû de mirovin û bi azardana te kîfxweşiyê dikin, koma mirovên ku te xwe ji wan re fîda kiriye û ev te weke ker hesab dikin! Ji bo kê dikî?! Here lipey jiyana xwe. Te çi îş ji wê ku û ser êşiyê he ye?!

-Birûskekê hundrî rîstûranê ronahî kir û ev di nav xeyalan de derxistim, wê jî çavên xwe kîp kumîşandibûn! Berî gihîştin dengê birûska ewran jî kîp guhên xwe girtin! Kêmek di wî halî de ma. Barîna baranê destpê kir û bi guş dibarî. Piştîre em rabûn û me cihê xwe guhert, li ber pencereya mezin dûr bûn û li ser maseyekê li kuncê rîstûranê rûniştin. Destên wê direcifîn. Çavên wê tirsîyabûn. Xweyî dabû. Destmalek li ser rûyê xwe de anî. -Min efo bike! Heta eger lîxîştina teqeya derî jî bilind be, ez ditirsim. An heta li xwarîngehê de kevçiyek bikeve xwarê an perdaxek bişikê,

wiha ez li tirsan metreke xwe bilind dikim.

Berdewam kir: “Çavên xwe peçatibûn, ez bi şûnekê ev girê dam û nişkêva tromîbîlek li kêlega me derbas bû, ne carekê, ne du caran, û ne sed caran, bi aweyek berdewam li kêlega me derbas dibûn, min her çavnehêr dikir ku min weke hevîr pan bikin. Min pena xwe bo Xwedê û Pêxemberan re dibîr, wan bi farsî digotin: Dey bêje ka tu endam û alîkarê kîjan partiyî, koçikê kurê koçikan?”.

-Di odeyeke gelek piçûk de bo du roj heta sê rojan ez xwedî kirim, odeyek ku li dîwaran, çirayên mezin û geş danîbûn û cihê rakîşana min tunebû, min hêvî dikir ku tenê bo bîstekê jî bibe kareba qut bibe, tev dunya li ber çavên min spî bibû, min çavên xwe dikomîşandin li ser hev û bi destên xwe dipeçatin, lê, kêrhatî nebû, Dinya tev spî spî bibû. Demaku ez dibirim bo derve, heta hefteyekê min ti tiştek nedidît. Min digot qey ez kor bûme, êdî çawan çav li nav çavên geş yê wan zarokan bikim ku bi peyvên Kurdî yê min çavên wan û mejiyê wan bi cîhana derve vedike?!

-Masûlkên min tev girtibûn, fikran hevka min girtbû. Tev resimên min dihatin pêş çavên min. Ew odeya teng û keçike germ ku laşeke xar û lawaz heye, ev rêya ku wan daxîstibû û bi tromîbîlê di nav metreke de derbas bûn! Gelo çima?! Çima ku zarokek Kurd hînî zimanê dayîka wê kiriye?!

-Bi dengê xwe yê nexweş berdewam kir: Ji min ra digotin ku ew zimanê te yê dirêj dibirin, ziman ku li gij ti kesekê/î neçûye û tenê tawana wê ewe ku bi Kurdî tevgeriya ye. Ji min ra digotin ku tu ji aliyê partiyekê ve bername ji tera hatine dan, di demekê de ku ti belgeyek ji ber destê wan de tune bû. Ji min ra digotin her ew dersên Kurdî yê ku tu ders didî bixwe belge ne, ew kincên Kurdî yê ku li xwe dikî bixwe belge ne, tu tawanbarî, zimanê te dibirin, ev zimanê dirêj û cudahîxwaz. Ji min ra telefon dianîn da ku digel malbata xwe bi axvîm.

Sê batom bideşt û hizbolahî li ser serê min disekinîn, diviya min bi zimanê Farsî digel malbata xwe ku Kurd in bi axvta, eger wisa neba poza min dişkandin.

-Li çavên wê rohdik dibarîn: “Ji bo min ew di-jwartîrîn îşkence bû. Ji ber ku digel dayîka xwe bi zimanê Farsî diaxivt?! Dayîkek ku li guhê min de lai yî laiya Kurdî xwandiye û ez bi Kurdî xwedî kirime. Çawan li derheq xwe û dayîka xwe de vê zilmê bikim û jêra bêjim mader?!

-Gefên birîna ziman an neçarkirina Kurdekê ji bo wê ku digel ayîka xwe bi zimanê Farsî bi axve, ev kupika tirs li zimanekê ye, helbet ev tişteke normal e, dagîrker ku xaka neteweyeke din dagîr kiriye, hewla mehandina wê neteweyê dide, û vegeşîna zimanê vê neteweyê mezintîrîn gef li dijî xwe dizane, her bi vê sebebê ye ku zimanê vê qut dike, wê asimîle dike û pirtûkên wê agir ber didê. Pirtûkên nû jêra dinivîse, kultûreke destkird bo dadîne û dîrok û zimanekê nû jêra didanê.

-Min jêra got: “Çima rehenda xebata xwe naguherî? Tu dikarî karek din ji encam bidî, te ev moral û şîyan heye”.

-Ez nikarim. Nan ji bo nappêj û goşt jî bo serjêker (qesab). Zimanê min serekî-tîrîn faktora hebûn û nebûnê ye. Helbet ya min şerê man û nemanê ye. Şerê min şerê nasnameyê ye. Eger zimanê min ji nav here, nasnameya min namîne. Divê em zarok û ciwanên xwe perwerde bikin da ku piştîre cihê me bigirin. Duniya her wiha nabe, min bi vê hêviyê ev hemû îşkence û heqaret kişand. Roja me jî dê her bê, ez ji vê yekê xatircemim. Evane tawanên min, tawaneke pîroz. Heta eger min bikujin jî, ez namirim.

-Bi barimteya bi qasî Yek milyon Tumenî bi awayê demkî li girtîgehê hatibûm azadkirin. 15 sal hesap li ser wê de hatibû sepanîn. Diviya roja piştîre xwe bo girtîgehê bida nasandin. Torikê xwe avêt milê xwe û li rîstûranê derkeve derve. Ez mam û giraniya wê çavîlîkirinê û peyvên wê.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Subhan Mewlûdî hîn jî binçavkiriye û qedera wî nexuya ye

Tevî derbasbûna mehekê li ser binçavkirina welatîyekî Kurd yê bi navê “Subhan Mewlûdî” temen 32 salî kurê “Ehmed” û xelkê gundê “Tengîser” yê girêdayî bajarê “Sinê” li derheq qedera navbirî ti zanyariyek serraşt ji ber deşt nîne.

Pêka çavkaniyek agehdar, ew welatîyê Kurd di girtîgeha îdareya Îtîlaata bajarê “Merîwan”ê de di bin lêpêçînê de ye û heta niha tenê carekê digel malbata xwe pêwendiya telefonî hebû ye.

Roja Çarşemî 29ê Pûşperê ew welatîyê Kurd, piştî zivirîn ji Herêma Kurdiştanê li sînorê “Başmax”ya bajarê “Merîwan”ê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin.

“Subhan Mewlûdî” bo heyama 5 salan li bajarê “Hewlêr”ê di kargehek çêkirina şîrîniyan de mijûlî kar kirinê bû ye.

Heta niha ji sedema binçavkirin û tohmetên ku li dijî navbirî hatine sepandin ti zanyariyek ji ber deşt nîne.

Kolberekî Kurd li ser sînorê bajarê “Banê” bi sedema teqeya hêzên leşkerî canê xwe ji deşt da

Roja Înê 28ê Gelawêjê kolberekî Kurd yê bi navê “Rehîm Mihemedî” temen 37 salî kurê “Se`îd” bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê “Hengejal” ya bajarê “Banê” canê xwe ji deşt da.

Leşkerên hikûmetê bi bê agehdarkirina berê teqeya raşteraşt ji wî kolberî kirine û bi sedema berketina guleyan bi sing û dilê wî, canê xwe ji deşt daye.

Termê wî kolberê Kurd ku, bo nexweşxaneyê “Selahedîn Eyûbî” ya bajarê “Banê” hatiye veguhaştin.

“Rehîm Mihemedî” xelkê gundê “Hewraz” û rûniştîyê gundê “Kewpêç siflî” yê girêdayî bajarê “Banê” ye.

Silêman Salik xelkê bajarê Mehabadê carek din hat binçavkirin

Roja Pêncşemî 27ê Gelawêjê, welatîyekî Kurd yê bi navê “Silêman Salik” temen 69 salî xelkê bajarê “Mehabad”ê piştî gazîkirin bo dadgeha Şoriş a bajarê “Pîranşar”ê carek din hat binçavkirin.

Pêka çavkaniyek agehdar, hêzên ewlehî bi hêceta wajokirina dosiyeyê wî welatîyê, navbirî bo dadgeha Şoriş a bajarê “Pîranşar”ê gazîkirine û piştî binçavkirine û bo cihek nexuya veguhaştine.

Roja Sêşemî, 22ê Gelawêjê, ew welatîyî bi danîna barimteya 3ê milyar Tumenî bi awayek demkî heta dema dadgehî kirinê ji girtîgeha bajarê “Nexed”ê hatibû azadkirin.

Roja Çarşemî, 12ê Gelawêjê, ew welatî piştî bidawî hatina heyama lêpêçîna wî di yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê “Urmiyê” bo girtîgeha bajarê “Nexed”ê hatibû veguhaştin.

“Silêman Salik” di heyama binçavkirina xwe de ji mafê hebûna parêzer û hevdîtin digel malbata xwe hatibû bêparkirin.

Ew welatî roja Sêşemî 7ê Pûşperê, bi bê hebûna belgeyên yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve li ser rêya bajarê Pîranşar_ Mehabadê hatibû binçavkirin.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmetên ku li dijî nevbirî de hatine sepandin ti zanyariyek ji ber deşt de nîne.

Kolberekî Kurd bi sedema teqîna mînê li ser sînorê Bane birîndar bû

Êvareya roja Çarşemî 26`ê Gelawêjê, kolberekî Kurd ê bi navê “Amanc Azerpûr” temen 17 salî û xelkê bajarê Seqizê bi sedema teqîna mînê li ser sînorê “Hengejal” a girêdayî bajarê Baneyê birîndar bû.

Ew kolberê Kurd, di dema kolberiyê de li ser mînê de derbasbûye û di encam de birîndar bûye.

Ew kolberê Kurd, bi sedema kûrahiya birînen xwe bo yek ji nexweşxaneyên bajarê Tehranê hatiye veguhaştin.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (428)



“Demokrat”eke yekgirtî,
Rojhilateke Bihêz



Serkevtina her neteweyekê
girêdayî yekîti û pêkvebûnê ye



Em pêkve bihêz in, û bi yekîtiya
xwe agirê tekoşînê geş dikin



Bi yekrîzî û îradeyeke nû, ber bi
neqîşandina siberojeke rohntir

